

Ravekirina hedarkirinê

Ev belavok rave dike ka hedarkirin çi ye û çawa tê bikaranîn û divê hûn kengî hewceya wê bin. Herwiha ew li ser sûd û metirsîyên bikaranîna hedarkirinê rave dike û ka wê çi jê were pê hesîn.

Ya girîng ew e, ew ji we re dibêjin ka hûn ê hewceyê çi bin ji bo amadekirina lênihêrîna xwe piştî hedarkirinê.

Ev belavok ji hêla penckeran, nûner û dêûbavên nexweşan ve hatiye nivîsandin.

Penckirin wata dema dermanên dête dain ji bo hestkirina aramia zêdetr l dema prosisê. Bi piranî dermanê hedarkirinê di demarê we (IV an jî bi rêya rehan) re tê kirin, lê hin caran ew bi rêya dev (devkî) an jî bi rêya rûpoşekê tê dayîn.

Navê '**Pencker**' ji pisporê çavdêriya tenduristî re ku vî karî dike tê gotin. Li jora neştergerîyê, gelek caran pizîşkê pencê heye. Li cihên din ên nexweşxaneyê an li klînîkên li derveyî nexweşxaneyê, ev dibe ku pezişkek an pisporek lênihêrîna tenduristî ya perwerdekirî be.

Sê astên cuda yên hedarkirina demarî hene. Navê wan wisa tên: Hedarkirina 'herî kêr', 'navîn' (hin caran jê re hedarkirina hişiyar tê gotin) û 'kûr'. Lêbelê, ast ne diyar in û girêdayî ye ka nexweşek ji dermanê hatî bikar anîn çiqas hesas e.

Gelo cûdahî di navbera hedarkirin û penckirinê çi ne?

Cûdahî ên serkîy di navbera hedarkirin û penckirinê da ev ne:

- asta hişiyariya we
- pêwîstiya amûrên ku alîkarî di bêhnkişandina we de dikin
- Bandorên mimkun ên alî.

Bi hedarbûn herî kêr û navîn, hûn xwe rehet, xew û rehet hîs dikin. Dibe ku hûn carinan bi xew ve biçin, lê şiyarbûna we hêsan e.

Bi bikaranîna penckirina giştî, hûn ê di dema neştergerîyê de bi tevahî bêbizav û nehişyar bin.

hedarbûn kûr di navbera herduyan de ye.

hedarbûna herî kêr (anksiolîz)	hedarbûna nerm (hedarbûn hişmendî)	Hedarbûna kûr
hun asteka kêma dermanê penckirnê dê wergirn	Hûn ê hinekî bêtir dermanê penckirnê dê wergirn	Hûn ê derzik bilindtir a yek an jî çend dermanên penckirnê dê wergirn
Hûn ê xwe rehet hîs bikin û ji tiştên ku li dora we diqewimin kêmtir xemgîn bibin	Hûn ê xwe pir rehet û xewa hîs bikin	Hûn ê di piraniya çareserîya xwe dinvisfîbn
Hûn ê şiyar bin û karibin normal biaxivin	Hûn ê xew bibin lê heke ji we were pirsîn hûn dikarin bi gelemperî biaxivin û rêwerzên hêsan bişopînin	Hûn ê dinvisfîbn û ne gengaz e ku hûn di piraniya çareserîya xwe de biaxivin
Belkî e ku hûn ê çarekirina xwe bi bîr bînîn lê ne hemû hûrgiliyên wê	Dibe ku hûn hin beşên çarekirina xwe bi bîr bînîn	Ne mimkûn e ku hûn pir ji çarekirina xwe bi bîr neynin - asta penckirnê dê li gorî hewcedariyê were sererast kirin
Divê hedarkirina herî kêr bêhnkişandina we bandor neke	Divê hedarkirina navîn bêhnkişandina we bandor neke	Dibe ku henaseia we sist bibe. pispora penckirnê we dê çavdêrî bike û heke hewce bike alîkariyê bike. Li Brîtanya divê hedarkirina kûr ji hêla karkerên ku asta wan a rahênan û jêhatîyê wek hedarbûn be were rêvebirin.

Hedarkirina devkî çi ye?

Heke hûn berî penca giştî gelek nîgeran bin, carinan dibe ku hûn bi tableteke hedarkirinê (mînak diazepam) rehet bibin, lê bi gelemperî di prosedurekê da rehetkirina te têrê nake. Demek pêdivî ye ku bixebite, û derzi dê di navbera mirovan de cûda bibe.

Divê hûn ji Nojdarê Giştî xwe **nexwazinn** ku dermanên devkî ji we re binivîsin ku hûn berî ku hûn werin nexweşxaneyê, heya ku hûn bi tîmê ku dê li we binêre lihevhatinek hebe, wekî din dibe ne gengaz e ku dermankirina we bidome.

Girîng e ku hûn bi zelaî bifikirin dema ku hûn bi doktorê xwe re hevdiîn bikin da ku li ser feyde û xetera zirara emeliyat û prosedûra xwe nîqaş bikin. Dûv re hûn ê hewce bikin ku formek îmze bikin da ku diyar bikin ku hûn razî ne ku operasyon an prosedûrê bikin.

Hedarkirina demarî çi ye?

Hundurîna nav demar ew e ku dema ku ji bo rehetbûna we rehetîyek bi lûleyek plastîk a piçûk (ku jê re kanûla jî tê gotin) tê derzî kirin ku bi gelemperî di damarek dest an destê we de tê danîn.

Pîzîşkê hedarkirinê li ser dayîna mêjera rast ji dermanê hedarkirinê û bi rêvebirina hemû karîgera rexe tîr perwerdekirin û rahênan. Pîzîşkê hedarkirinê yê te dê di dema dermankirina te de bi te re bimîne û asta nefes û oksîjenê bişopîne.

Gelo di bin hedarkirina demarî de çi ji çarekirinan ve dibe werin pêkanîn?

Gelek dermankirin û vekolînên piçûk dikarin bi hedarkirina demarî ve bi pêk anîn, gelek caran bi bêhestkirina taybetciyê re. Çend mînak hene weke:

- biyopsiyên çerm an memikan
- tamîrkirina biçûk a hestiyên şikestî
- neşteragerîya biçûk ji bo çerm, dest an jî pî
- rê û rêbazan ji bo venaskirina pîsgirêkên ku bi zik (endoskopî), sîh (bronkoskopî), qolon (qolonoskopî) û mîzdankê (sîstoskopî) ve tîr girêdan
- rakêşana diranan an jî çarekirinên diranî yê din
- neştergerîyên çavê, wekî rakirina katarakt.
- neştergerîya ciwankarî

Hin dermankirinên berfirehtir jî dikarin di bin sedasyon û anestezîya herêmî da bên kirin.

Hedarkirin di neştergerîyên diranan û klînîkên ciwankarî de

Dermankirinên di bin hedarkirinê de pir caran li nexweşxaneyê tîr kirin. Lêbelê, ji bo dermankirina diranan jî hedarkirin dibe di neştergerîyê diranan an klînîkê pîspor a diranan de were peyda kirin. Hedarkirin ji bo neştergerîya ciwankarî dibe li klînîkê were kirin. Pîvanên ji bo lîvêrîna ewle ya te wek xwe dimînin. Pîzîşkê hedarkirinê, û yê diranan an cerrahê ciwankarî dê bi te re li ser cûreyên hedarkirina guncan bipeyivin - ji bo dermankirina diranan ji bo mezinan û zarokan cûreyên cûda hene. Divê ew rave bikin ka dê di dema dermankirina te de çi bibe û çî metirsî hene. Girîng e ku tû her şîret û rêwerzên ku ew didin te bi baldarî bişopîne.

Çi feydeyên ê hene eger ew vebijarkek ji bo dermankirina te?

- Hedarkirin zû dixebite û doz dibe were sererast kirin da ku te mîqdara rast bistîne.
- Ew dihêle tû di dema dermankirina xwe de vesihandî bibe. Dibe ku tû piştî dermankirina xwe pir zêde bîr neke.
- Ji bo hin proseduran, dibe ku li şûna penca giştî hedarkirinê bidin, ku dibe bibe alîkar ji bo nexweşên ku hin pîsgirêkên bijîjkî li cem wan hene.

- Bi piranî bandorên alî yên wê ji yên penca giştî gelemperî hindiktir in.
- Başbûn ji hêla hedarkirina demarî ve ji penca giştî bileztir e, yanî heger tû baş bihesine, tû dikare di navbera saetekê de vegere mala xwe.

Gelo pêguherên hedarkirinê çi ne?

- **Penckirinak giştî** : tû li seranserê neştergerîyê bi tevahî bêhiş be û tu bîranîn li ser prosedurê tune be.
- **Penckirina herêmî bê hedarkirinê**: tû di dema dermankirina xwe de bi tevahî şiyar be, lê dê rehet be. Dibe ku perdeyeke li pêşiya te were bicihkirin da ku nehêle ku tû neştergerîyê bibîne.

Gelo kê/î biryar dide heger hedarkirin li min were kirin an na?

Di dema nixandîna de tû dikare vebijêrka hedarkirinê bi bijîşka/ê xwe an jî bi hemşîreyê re gotûbêj bike. Heger ew ji we re nehatibe pêşniyar kirin, tû herdem dikare bipirse ka standina wê gengaz e an na.

Eger tû bi rewşên bijîşkî yên heyî re di bin metirsîyê de be, wê bijîşkên te bi te re vebijêrkan nîqaş bikin. Wê hingê tû dikare ji bo we vebijarka çêtirîn bi hev re qebûl bikin.

Ez dikarim çi bikim ku ji bo procedura hedarkirinê amade bikim?

- Heger tu kesên ku tû li wan dinêre hebin, wek mînak zarok an kesên mezin, divê tû bi kesekê/î din re bi xave ji bo ku ew li wan mîqate bin heta roja dî.
- mezinên jêhatî divê bi erebe an jî taksîyekê bi awayekî giştî we bibe malê- piştî hedarkirin bi kar anîna veguhastina giştî nayê şîretkirin. Ji ber ku dibe ku bandorên hedarkirinê heta 24 saetan bidomin, divê ew di tevahiya şevê de li wir bimînin û li te binêrin.
- Hemû dermanên xwe bi xwe re bibin nexweşxaneyê, tevî wan her inhaler jî û dermanên bazarî ku hûn bi rêk û pêk distînin jî di nav da.
- Heger tû nexweş be an bi sermê ketibe an ducan be, ji kerema xwe bi nexweşxaneyê an klînîka xwe re têkilî bike, ji ber ku dibe ku ne ewleh be ku hedarkirinê bikar bîne. Dibe ku dermankirina te ji nû ve were saz kirin.
- Bila bijîşka/ê we di roja neştergerîyê de bizanibe heger tû zarokên xwe şîr didin an na.
- Beriya hatina li nexweşxaneyê – tevî jêxistina cîlê neynokan û zêr û cewheran – serçavên xwe ji makyajê jî paqij bikin. Tû dikare gûstîla zewacê li xwe bihêle.
- Bi xwe re kincên fireh ên wek kirasê xewê an jî ji hiriya pezî bîne da ku te rihet û germ bihêle. Pêlavên pan ku pêkirina wan hêsan e pêkin.

Gelo ez dikarim beriya hedarkirina xwe tiştêkî bixwim û vexwim?

Wê klînîk an jî nexweşxane şîretê bidine te ka tû ê kengî xwarin û vexwarinê rawestîne.

Ji bo hedarkirina navînî û giran, divê tû şeş demjimêr berî dermankirinê dev ji xwarinê berde, lê tû dikare heya du demjimêran berî dermankirina xwe mîqdara normal "şilavên zelal" vexwe. Tiştê rohn weka avê, şerbetên rohnkirî (bê perçên biçûk) û çaya reş an qehweya zelal vedihewîne.

Dive ku tû zêdetir ji vî demê dev ji xwarin û vexwarinê bernede.

Ji bo hedarkirina kêmtirîn, rojgirtin gelek caran ne hewce ye, lê girîng e ku tû rêwerzên rast bi nexweşxaneyê xwe re seh bike.

Heger nexweşîya şêkir bi we re hebe, divê hûn ji bo şîretên taybet li ser dema birina dermên û rawestandina xwarin bipirsîn.

Di roja dermankirina min de dê çi bibe?

Tû dê bi piranî kirasê xewê li xwe bike. Gava ku tû bigihîje odeya neştergerîyê wê hedarker amûrên temaşekirinê bi te ve bixe. Amûrên ku têne bikar anîn dê bi piranî ev bin:

- bazinê xwînpestan li ser milê te
- amûra li ser beşa joîn ji singê te ji bo tomarkirina kutekute dil
- gustîla ji bo pîvana astên oksîjenê yên we
- boriyeke zirav û plastîkî ku mêjera duanoksîda karbon a tû berdide derve dipêve. Ev bi piranî bi rûpoşa oksîjenê ve girêdayî ye.

Gelo çawa dermanê hedarkirina demarî tê dayîn?

- Hedarkirin bi rêya delopê (kanola) ku di nav demarê li ser milê we an jî li piştê destê we tê dayîn. Heke di dema prosedurê da pêdivîya we pê hebe, dikare bêtir dermanê hedarbînê bihê dayîn. Di hedarkirina kûr de tû ê bi piranî û bê sekinandin dermanekî di nav demarê we re bistîne.
- Tû bi piranî oksîjenê an bi rêya boriyekê plastîkî di nav pozê we de an jî bi rêya rûpoşê bistîne.

Gelo bandora dermanê hedarkirinê çi ye?

Ew li gorî mējara dermên di navbera ên distînin de cûda ye. Hûn ê di navbera hedarkirina kûr de di xewê de bin, lê di hedarkirina sivik de tû bi piranî bi kêfxweşî bi rihet bihesê.

Gava ku me ji çend nexweşan li ser bandora hedarkirinê pirsî, wan besiva me wisa dan:

'Min xwe dît ku min ji xwe ve çûyî û di nav xewn û xeyalan de bûm'

'Min fikirî ku ez di neştergerîyê de hişiyar bûm, lê ez hin caran nêzan ketim piştê jî nişkê ve saetek derbas bibû.'

'Ez ji dil vehesîm û şa bûm'

'Ew tiştê ecêb bû – ez ji tiştê ku li dora min diqewimîn pir veqetandî bûm.'

Çûna malê piştî neştergerîyê

- Heger li we hedarkirina sivik an navîn hatibe kirin, tû dikare bi piranî di saetekî jî dermankirina xwe de biçe malê.
- Heger li we hedarkirina kûr hatibe dayîn, wê başbûna we di navbera dudemjimêran an betir bidome. Tû kengî dikare biçe malê jî bi wê yekê ve girêdayî be ku çiqas wext ji te re dive ku tû reht bibe piştî emeliyata te.
- Wekî ku berê hatibû gotin, wê hewce be ku kesekê/î mezin û li ser xwe we bi erebê an bi tekiyê bibe malê – û wê baştir be bê bikaranîna veguhastina giştî – û bi we re jî di tevahiya şevê de bimîne. Eger te kesek dabîn nekiribe ku piştî dermankirinê bi te re be, dibe ku tû hewce bibe ku tû şevê li nexweşxaneyê bimîne, an jî dibe ku hewce bike ku dermankirina te were paşxistin.
- Dibe ku hedarkirin nehêle tû baş li ser piyên xwe bisekine. Ji kerema xwe li ser derenceyan hişyar bimîne û heger tû xwe bêserûber hîs bike divê kesek bi te re hebe.

- Dibe ku biryardayîna we piştî dermankirina we heta 24demjimêran bandor be, ji ber vê yekê divê hûn di wê demê de biryarên girîng nedin. Divê tû tişteki belav neke li ser medyaya civakî/forumên giştî.
- Pêdivî ye ku tû venegere ser karê xwe, li kesên girêdayî be te ve xwe nenêrine, erebe ne bajone, xwarinê çêneke an alavîya karkirinê neşixulîne heta 24 demjimêran ji ber ku dibe ku ev demek dirêj bigire ku derman ji laşê te derkeve.
- Piştî neştergerîyê divê tû 24demjimêran alkol venexwe an hebên razanê nebe.
- Wê bijîşka/ê we şîretên nivîskî der dermankirina li malê bide we.
- Wê nexweşxane jimarayeke telefonê bide te ku tû bi wan re têkeve têkiliyê heger rewşa te li malê ne baş be.
- Ger piştî prosedurê tû bi nîgeran be, xwe nebaş hîs bikê, an jî nikanibe hejmara pêwendiya nexweşxaneyê bibîne, tû dikare bi Nojdarê Giştî ê xwe re telefon bike, zengila 111 bidin an jî biçe qezaya herêmî û beşa lezgîn bi kesekê mezin re eger hewce be.

Bandorên alî, tevlihevî û metirsî

Di hedarbûna nûjen de, pirsgirêkên cidî ne berbelav in. Metirsî nayê rakirin bi tevahî, lê derman, amûr û rahênanên nûjen di salên dawî de kirin ku hedarkirinê bibe rêbazeke ewledartir.

Pizîşkê pencê pir miqate ne ku xwe ji hemû metirsîyên ku di vê beşê hatine destnîşankirin dûrbixin. Ew wê bikaribin agahiyên zêde li ser her ji van metirsîyan û awayên dûrxistina xwe ji wan bide we.

xelk cêwaz in di awayê şirovekirina peyv û hejmaran de. Pîvan jêrîn ji bo alîkariyê hatêye dayîn.



Herwiha hûn dikarin agahiyên zêde ji rûpelên agahiyên nexweşan li ser malpera Kolejê bibînin: www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji

Metirsîyên di dema hedarkirina te de

- Dibe ku rêjeya bêhnkişana we hêdî bibe. Ev di hedarkirina kûr de bi patybetî berbelave, lê çî gav dermanê hedarkirinê were bikaranîn metirsî heye. Heger pêwîst bu, hedarkerî we di temaşekirina we de jîr e û dikare alîkariya we di bêhnkişana we de bike.
- gelek berbelave ku xwînpeştana we piçek dakeve, lê ji bo çarekirina vê jî hedarker hatiye rahênan kirin.
- gelek caran ew birînka şîn piçûk dimîne di cihê ku derzî (Kanola) hatîbû danîn.
- Hestkirina bi nexweşî an vereşîn ne berbelave.
- Metirsîya gelek kêr heye ku naveroka mîdeyê bikeve sihênt te. Girişg e ku meriv rêwerzên xwarin û vexwarinê bişopîne da ku ev talûke pir kêr bimîne.
- Pir kêr e ku karvedanên hestokî ji ber dermanên hedarkirinê çêbin.

Metirsîyên piştî dema hedarkirina te de

- Ew gelek caran çê dibe ku meriv gêj û sist be li ser lingên xwe. Dibe ku tû di metirsiya daketînê de be, nemaze heke tû pîr be.
- Dibe ku hedarkirin heta 24 demjimêran biryardan û bîra we bandor bike.

Pirsên ku dibe tû bixwazî li ser hedarkirina xwe bipirse

- 1 Gelo wê kê/î dermanê hedarkirinê bide min?
- 2 Kîjan curê hedarkirinê çêtirîn e ji bo min û procedura ku ez dikişînim?
- 3 Ma wê tu metirsîyên taybet werin li min?
- 4 Divê ez kengî dev ji xwarin û vexwarinê berî hedarkirinê berdim?
- 5 Divê ez kengî werim birin?

Çavkaniyên zêde

- Lêniheîrîna kesekê/î ku bi penca giştî an hedarbûn derbas kiriye (www.rcoa.ac.uk/patientinfo/sedation).
- Akademiya Kolejeyên Bijîşkî û Qirafî. *Rahênanên Hedarkirina Ewle ji bo Rêbazên Çavdêriya Tenduristî: Nûvekirinek*. AoMRC, 2021 (<https://bit.ly/3wEoHGy>).
- Akademiya Kolejeyên Bijîşkî û Qirafî. *Rahênanên Hedarkirina Ewle ji bo Rêbazên Çavdêriya Tenduristî: Pîveran û Rêberî*. AoMRC, 2013 (<http://bit.ly/301ndq8>).
- Komîteya Şewirmendiya Navxweyî ya ji bo hedarkirinê di bijîşkiya dev û diranan. *Pîveran ji bo Hedarkirina Şiyar di Beşa Lêniheîrîna Diranî de*. RCS, 2020 (<https://bit.ly/3vz0YWP>).
- Herwiha belavokên di derbarê talûkeyên taybet yê ku bi anestezîk an bi pencê ve girêdayî ne li ser malpera Kolejê berdest in: www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahîya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yê gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên jî bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi fîma bijîjkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin nîqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwirek neyê bidesthîlgirtin. Ev jî bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpisriyariyê, ji kerema xwe ra li vir bifîkînin

(www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji).

Hemû wergeran jî alî wergervanên jî civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsinor) tên çêkirin. Çawanîya van wergeran jî bo duristîya van heta jî dest tê tên venihartin, lê xetere heye ku hin agahîyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

Ji me re bêje nerîne te çi ye

Em pêşniyaran jî bo baştirkirina vê belavokê pêşwaz dikin.

Ger têbînîyên te hene ku tû dixwaze bighîne me, ji kerema xwe jî wan bi e-mail bişîne li ser: patientinformation@rcoa.ac.uk

Royal College of Anesthetists

Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG
020 7092 1500

www.rcoa.ac.uk

Çapa Duyemîn, Hezîran 2021

Ev belavok dê di nav sê salan de jî roja weşanê ve were nixandîn.

© 2021 Royal College of Anaesthetists

Dibe ku ev belavok bi armanca hilberîna materyalên agahdariya nexweş were kopî kirin. Ji kerema xwe vê çavkaniya eslî binvîse Heke tû dixwaze beşek vê namilkê di weşanek din de bikar bînin, divê spasnameyek guncan bê dayîn û logo, marqeb û wêne werin rakirin. Ji bo bêtir agahdariyê, ji kerema xwe bi me re têkilî bike.